

Agahiyên girîng ji bo we yê ku welîyên zarokan in li pêşdibistan û dibistanan Çi çêbûye?

Polîsan der barê kesekî ku berê nuha di pêşdibistanên şaredariyê de kar dikire lêpîrsîna destpêkê li ser dikire. Di lêpîrsîna destpêkê de delîl hene ku wî kesî gelek caran destdirêjîya cînsî li ser zarokan kiriye.

Tê diyarkirin ku destdirêjî li pêşdibistanan pêk hatiye li ser neh(9) zarokan wek gilîker û hate piştastkirî/ tekîdkirin.

Ji ber ku ev tawanbare miriye, lêpîrsîna pêşwext hatiye girtin û tu sûcdar nayê kirin.

Ji bo ku rewşê bi awayekî herî baş bi rêve bibe, şaredarî ketiye rewşa karmendan û ji bo hemû kesên ku mexdûr bûne, komeke taybet çêbiken bo harîkariya hemî kesanan biken evên toşî evê çendê bûyîn.

Kar û mîsyona me ya herî girîng a niha ew e ku em ji zarok, welî û karmendan re alîkarî û piştgirî bikin.

Em fêhmî dikin ku gelek niştecîhên me niha gelek pîrs, fikir û raman hene. Hûn dikarin bi çend awayên cûda bi me re têkilî/peywendîyê biken - cîhek me ya terxan kirî ku hûn dikarin ji bo alîkarî û piştgirîyê werin, me hejmarek tîlefonek taybetî heye ku hûn dikarin tîlefonekî bikin, em malpera xwe rojê carekê bi agahdariya herî dawî nûve dikin û em ê vê hefteyê her roj civîneke danîn.

Di heman demê de, me dest bi karê vekolînek ji derve kiriye ka ev yek çawa dibe û em dikarin çî bikin da ku careke din dubare nebe.

Ji bo ku di vê rewşa dijwar de bi awayê herî baş li cem we bin, çî ji destê me tê em ê bikin.

Tîmek piştgirî ji bo kesên ku dixwazin kesek pê re biaxivin heye. Hûn dikarin îro, paşê, yan jî sibê an paşê piştgirî bistînin. Li jêr pêzanîn ji bo peywendîyê kirinê ji bo hemî hewildanên piştgiriyê hene.

Dîsan jî ya girîng e ku hûn wekî welî, zanibin ku hûn çawa herî baş piştgiriyê bidin zarokên xwe û bi zarokên xwe re li ser tiştên ku qewimîne biaxivin. Bi kurtî, şîret ew e ku hûn aram bin, zarokên xwe nepîrsin û zextê nekin û bihêlin ku ew bi leza, heza xwe biaxivin/ bi peyîvin. Di vê materyalê de bêtir agahdarî û pêzanîn hene li ser meriv çawa bi zarokê xwe re biaxive, bi peyîvî.

Piştgiriya ji bo zarokan:

Nîşaneyên ku dibe ku zarokek toşî dest dirêjîya cinsî buye, hatî kirin, guhertinên di tevgera cinsî da, tirs an fikir, kabûs,, xewnên nexoş û caran jî paşveçûna pêşveçûnê de hene. Nîşanên fizîkî, wek birîn, birînên şîn xuya dibin, nêzîkî demê ev destdirêjî hatî encamdan.

Girîng e ku dey û babên zarokan ji guhdaran bin axaftinên li ser jiyana rojane ya zarokê re bersivdar û vekirî bin, lê bêtir ku pirsên zext û lêpîrsînê bikin. Ger guman hebe, dibe ku alîkariya profesyonel ji, bo nimûne, piştgiriya malbatê hewce bike.

Ger zarok dest bi vegotina destdirêjîyê bike, divê dey û babên zarokî bi hûşyarî guhdariyê bike bêtir ku zarok bipirse û stresê bike. Her weha girîng e ku welîyê zarokan hestên xwe yê dijwar wekî hestên xemgîniyê anko ture bunê nîşan nede, da ku zarok xemgîn nebe.

Encamên destdirêjîyê hesab ka çî core peywendî çêbo bi vi tawanbarî re, dema destdirêjî chêtir û ka reaksiyona dewruberî mirovî çewa ye.

Şîroveya zarokê ya li ser vê rewşê kartêkirina xwe heye ji ber eve girêdaye bi reaksiyonên day û bavan ve lewma aramîya malbatê û stabîlîtiya malbatê ji bo saxbûnê girîng e.

Dey û bavê zarokî dikarin alîkariya zaroyî biken û vekirî bin dema ku zarok amade bêt ji bo bi axeftî li ser destdirêjîyê. Rûtîn û jiyana rojane ya ewle jî ji bo başbûna zarok girîng in. Ger zarok nîşanên xemgîniyê, guhertinên pêşveçûnê, an tevgerên cinsî nîşan bide, welî divê alîkariya pisporê bixwaze.